

Bêmalê! (*)

Socin û Prym -

St.Petersbourg 1890

Tîpguhastin: Cankurd

Bêmalê me te dî li hay Wanê (1),
Pišta xwe da erdewanê (2),
Ramîsana te bûn (3) parîk şekir, ketine (4) ber vê
(5) zumanê,
Rebenê! soz û qirarê temam bûne,
Gul û beybûna bi hev ra bûne,
Heşiya qazê li bejna zirav bela bûne,
Rebenê kirasê sipî li xwe meke, sare, çile li te
sare,
Bi te ra soze, yek qirare,
Xeynê bejna zirav ji xwe ra nagirim dost û yare,
Gava tu bi xortê gundî biştexilê li min zulme, li te
qare (6),
Kina min a li nav kina,
Bejn (7) avî rihan e, av li bin e,
Emê herin welatê xerîbiyê,
Ji Xwedê û pê ve kesik (8) nuzane em ku ne...
Ez çûm welatê xerîbiyê, mi ji bîr meke,

Mi bike sêvê (9) Xelatî, a dî di berîka xwe ke,
Gava bêm bîrê, sêv biderêxe, a li ber bêvla xwe
ke,
Suwar (10) dibû li ciwaniyê (11),
Berê xwe da welatê xerîbiyê,
Xemê min ne tişteke, qese tembariyê,
Kirasê sohr (12) li xwe meke, li te nayê,
Kanî soz û qîrar, te bi mi ra (13) dayê,
Tu pey soza (14) xwe nayê,
Li xatirê te sê sal (15) ketim belayê,
Gava te nebînim sebra mi nayê,
Li kullekê meke tarî,
Dev li kanê gul dibarî,
Were cem min, destê xwe deynim li ser sîngê bi
h'elal malî,
Mi te dî bû li ser dêkê,
Delalê min hat, li te e'bakê (16) wê ban dikê,
Xwedê muradê me herdu (17) tevda bikê,
Minê (18) dî bû ser dirûnê,
Hesso hesiya, vê ra dikê (19) pevçûnê,
Bejna min (20) gula nû xemilî,
Ser min û delalê min (21) çûne gilî,
Gava te nebînim agir (22) ser dilê min (23) şuxulî,
Çi subeye (24)? subake sarî,

Li kullakê meke tarî,
Destê xwe di destê mi ke,
Emê hevdu birevînin pisarê (25) vî buharî,
Ezê bimirim (26), tu sebebî,
Tirbê min (27) li mala bavê te bî,
Gava tu biborê, lingê xwe li tirbê mi xe,
Bê set (sed) reh'met li te bî,
Çiyayê bilind bê ba nabê,
Newalê kûr jê av xalî (28) nabê,
Qîzê vê heyamê ji heft (29) sala
û pêve li mala bavê xwe bê dost û yar nabê..

**Têbîniyên, ku li binê text (têkst) hatine
nivîsandinê:**

- (1) dî bû li lay Wanê.
- (2) wêrdewanê.
- (3) bûne.
- (4) ketne.
- (5) vî.
- (6) qehre.
- (7) a te.
- (8) kes.
- (9) sêva.
- (10) helqê delal suwar.

- (11) ceniê
- (12) sohra.
- (13) mir.
- (14) soz û qirara.
- (15) sê sala.
- (16) malê me, li te ébayê.
- (17) bê malê.
- (18) min.
- (19) serê subê Heso dayê şer.
- (20) mi.
- (21) delalê malê.
- (22) agirê.
- (23) mi.
- (24) subake.
- (25) bi serê.
- (26) bimirime.
- (27) mi.
- (28) bê av.
- (29) heft.